

Agahiyên li bara venêrîna daneyan

Fayla navendî ya hevcivînan

Li gorî madeya 13 û 14 ya Rêzikên Giştî yê Parastina Daneyan (DSGVO)

Nav û Hûrgiliyên pêwendiyê yê kontrolkarî:

Bundesamt für Fremdenwesen und Asyl (Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye)
Modecenterstraße 22, 1030 Wien
Tel: +43- 59 133 98 7004
Faks: +43- 59 133 98 7399
e-name: BFA-Einlaufstelle@bmi.gv.at

Hûrgiliyên pêwendiyê yê berpîrsê parastina daneyan:

Tel: +43- 59 133 98 - 0
e-name: BFA-Datenschutzbeauftragter@bmi.gv.at

Armanca venêrîna bo daneyên ferdî bi vê mebestê ye:

Venêrîna agahiyên têkildarî statûya kiryanan (daneyên kiryanan) yê li gorî Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye bi taybet têkildarî daxwaz, biryar, veçêkirinên qanûnî, paşvegerandin û vegeîrînan dilxwazî diyar bûne

Bingeha qanûnî bo venêrîne:

Madeya 28, 29, 33 û 58 ya qanûna federal bo diyarkirina destûrên giştî têkildarî kiryarên li ber Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye bo wergirtina rewşa parastina navneteweyî, destûra cîwarbûnê ji ber mercên awarte, paşvegerandin, paşavêtina jiholêrakerin û destûrdana karên dawîna cîwarbûnê û dayîna belgeyên Avûstryayî bo biyaniyan (Peymana Kiryanan BFA, BFA-VG)

Dirêjahiya dema ku agahiyên ferdî yê werin xwedîkirin:

Daneyên li gorî Peymana Kiryarên BFA hatine girtin her dereng dê bi awayê fîzîkî werin pakkirin

1. dema şexs hemwelatîbûna Avûstryayê wergirtibe û êdî ew dane bo derxistina belgeyeke dayî bo wan şexsan wekî biyanî pêwîst nebe;
2. dema Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye yan Dadgeha Îdarî ya Federal ji mirina şexs agahdar bûne û 5 sal jî ji ser ra derbas bûbin, yan
3. deh salan piştî biryara dawîna kiryarê li ber Daîreya Federal a Koçberî û Penaberiye yan Dadgeha Îdarî ya Federal, yan piştî paşwergirtina daxwazekê, kutabûna daxwaza kiryara têkildar, yan dema ku êdî daxwaz bêbingeh e. Ev wê demê bi kar nayê ku qedexeya ketina hundir yan cîwarbûnê bo şexs bi kar tê. Eger itibara karê demkî yê kutakirina piştî xala diyarbûyî li mehkîmbûna yekem da vala bûbe, dane ji ber bêbingehbûna itibarê pak dibin.

Desteya kesên daneyên ferdî werdigirin:

Navendên ewlehiyê; rayedarên darizandinê; dadgehên medenî û cinayî herwiha zîndan; dadgehên îdarî yê parêzgehên federal; Daîreya Komîsaryaya Bilind a NY bo Penaberan li Avûstryayê; aliyên lihevkirinê yê peymanekê bo diyarkirina dewletê rayedarên têkildar ên dewletê yê dewleta ku biryar e rêzikên Dublin'ê pêk bînin, rêzikên ku bo lînêrîna daxwaza penaberiye yan daxwaza parastina navneteweyî xwedan şîyan e; rayedarên biyanî yê

berpîrsên pêkanîna Konvansiyona Jênêvê bo Penaberan in, dema diyarkirina pênasayê herwiha dayîna penaberiyê bêyî bo van rayedaran pêkan û mimkin nîne û dikare pêbawer be ku ev dane nakevin destên rayedarên wan welatan ku penahxwaz jê tên yan ditirse ku lê were girtin; Rayedarên nûnerên Avûstryayê: rayedarên diyarbûyî li Peymana Cîwarbûna Demkî û Herdemî ya Biyaniyan; rayedarên hemwelatîbûnê; beşên tomarkirina hemwelatîbûnê; rayedarên diyarbûyî digel pêkanîna Peymana Karê Biyaniyan; rayedarên cinayetên malî; rayedarên rifaha ciwanan; rawêjkarên qanûnî (madeya 49 heya 52 ya Peymana Kiryaran BFA); şewirmendên vegeîrî; rayedarên bacwergirtinê; wergêrên devkî bo xizmeta wergera devkî li gorî madeya 12a ya Peymana Kiryaran BFA; Wezîrê Federal ê Hundir; lijneyên federal û parêzgehî yên karên têkildarî pêkanîna Lihevkirina Muqate û Xizmetên Bingehîn dikin; Xizmetên Giştî yên Karpeydakirinê yên Avûstryayê (AMS) û rayedarên xwecih û erkdar ên naveroka muqatebûnê û arîkariya têkelbûnê; dezgehên navçeyî yîn tenduristiyê û Federasiyona Avûstryayê bo Dezgehên Sîgorteya Civakî; Wezareta Fedral a Ewrûpayê, Karên Têkelbûnê û Derve; Binyada Têkelbûna Avûstryayê; daîreyên xwedanşert bo dayîna sûdên civakî yan yên din bo veguhestinê; rayedarên tomarkirina cîwarbûnê; Lijneya Ombudsman (Volksanwaltschaft); Amara Avûstryayê; rayedarên welatê jêder; xalên neteweyî yên pêwendiya rayedarên din ên cîwarbûnê li welatên endamên YE bi rêya Wezîrê Federal ê Hundir; Dadgeha Îdarî ya Federal; dezgehên ewlehiyê li welatên din ên endamên YE bo armanca ewlehiyê yan polîsê cinayî, pergala pasaportê û kontrola sînor; Dezgeha Yekîtiya Ewrûpayê bo Hevkariya Polîsî (Europol) bo armancên ewlehiyê yan polîsê cinayî, pergala pasaportê, polîsê biyaniyan û kontrola sînor; dezgehên ewlehiyê yên welatên sêyem bo armanca ewlehiyê yan polîsê cinayî (li gorî pêş-şertên li madeya 58 û 59 ya Peymana Parastina Daneyan) û pergala pasaportê, polîsê biyaniyan û kontrola sînor wekî li rêzikên Beşa V ya DSGVO diyar bûye; Interpol – Sekreteriyaya Giştî ya Saziya Polîsê Navneteweyî ya Cinayî bo armancên ewlehiyê yan polîsê cinayî (li gorî pêş-şertên li madeya 58 û 59 ya Peymana Parastina Daneyan) û pergala pasaportê, polîsê biyaniyan û kontrola sînor wekî li rêzikên Beşa V ya DSGVO diyar bûyê; Rayedarên Tomarkirinê yên ÇavkaniyaPIN li gorî pîvanên diyarbûyî li Peymana Dewleta-Venêrîner: Wezîrê Federal ê Hundir; IBM Österreich - Internationale Büromaschinen Gesellschaft m.b.H.; Microsoft Österreich GmbH; Bundesrechenzentrum GmbH; Atos IT Solutions and Services GmbH

Mafên mijara daneyan:

Heqê gilîkirinê li Rayedarên Parastina Daneyan a Avûstryayê (1030 Wien, Barichgasse 40-42, tel +43 1 52 152-0, e-name dsb@dsb.gv.at) li gorî madeya 24, benda 1 ya Peymana Parastina Daneyan bi kar tê (DSG).

Heqê dest gihîştinê li madeya 15 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê sererastkirinê li madeya 16 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê pakkirinê ('heqê jibîrbûnê') li madeya 17 ya DSGVO diyar bûye.

Heqê kêmsînorkirina venêrîna daneyan li madeya 18 ya DSGVO diyar bûye.

Tu itiraz nayê qebûlkin.